

Bi kurtayî li ser bekelorya/lîsa siwêdî



Her ciwanê li Siwêd ku dibistana binge hî xilas kiriye xwedî mafê xwendinî neke sê salî ya bekelorya/lîsa ye. Xwendina bekelorya/lîsa, bingeheke baş jibo kar, xwendegeha bilind, pêşxistina şexsî û danûstandî neke geş di civatê de dideynê.



18 programên netewî/gîştî

Qanûna dibistanê ku 1:ê heyva tîrmehê/temûzê(6) dest pê kir bi yek çavî li bekelorya/lîsa ya serbixwe/şexsî û ya gîştî dimeyîzêne.

18 programên netewî/gîştî di bekelorya/lîsa de hene, 12 ji wan yê meslek in û 6 ji wan yê amadekirina/hazirkariya xwendegeha bilind in. Hemû programên ku hene sê salî ne.

Pîştî xwendina programeke meslek, gerek xwendevan ji meslekekî/karekî re amade bin, kalîta xwendinê bilind be û hostayîyeke baş bide. Gerek mirov karibe pîştî bekelorya/lîsayê raste-rast dest bi meslekekî/karekî bike. Hemû xwendevanên programa meslek dikarin di xwendina xwe a bekelorya/lîsa de bingehekê bo xwendegeha bilind jî deynin. Jibo xwendevan karibe vê bingehekê jibo xwendegeha bilind deyne, dive dersên ku vê bingehekê didin hilbijêrin.

Gerek xwendevan pîştî xwendina programeke ku wan ji xwendegeha bilind re hazir dike, hazir bin û karibin dest pê bikin.

Ji xeyn ji wa 18 programên gîştî, pênc programên agahdarkirinê jî hene. Programên agahdarkirinê jibo destpêkirina yek ji wa 18 programên gîştî ne.

Li hinek dibistana xwendinin hene ku ji programên gîştî cuda ne: varyantên taybet/diyar, xwendinên jibo hilbijartineke netewî û xwendinên sporê yên ku ji aliyê netewî/gîştî de hatine qebûlkin, NIU.

Daxwaziya mafdariya bekelorya/lîsa

Qanûnên mafdariyê jibo ku mirov karibe dest bi xwendineke bekelorya/lîsa bike, jibo programa meslek û programên ku hazirkariya xwendegeha bilind bike ji hevdu cuda ne.

Jibo ku mirov karibe dest bi programeke gîştî bike, divê mirov zimanê siwêdî an zimanê siwêdî wek zimanê duwem, inglîzî û matematîk xilas kiribe, çî programa meslek û çî ya haziriya xwendina bilind be.

Jibo destpêkirina programa meslek, ji xeyn ji wa dersan divê mirov notên pênc dersên din jî standibin, yanî tevde heşt ders.

Jibo programa hazirkariya xwendegeha bilind, divê mirov ji xeyn ji wan dersan, di neh dersên din de jî notên maqûl standibin.

Jibo programa aborî-û zanyariya civakî û jibo programa xwendina ziman, felsefe, dîrok û hwt divê çar ji wa dersan cografya, dîrok, zanyariya civakî û zanyariya olî/dîn be. Jibo programa xwezanasî/ilmî û teknolojî jî, divê sisê ji wa neh dersên xilaskirî biolojî, fîsiya û kîmya bin. Jibo programa estetîk, hîlbijartina wa her neh dersên din serbest e.

Jibo hinek xwendinên estetîk û sporê, dibe ku dersin taybet bêne xwestin/hebin.

Kurş/ders û pîlanên beşî

Bekelorya/lîsa siwêdî li ser kursa hatiye avakirin. Ev yek tê wê manê ku xwendevan kurşekê an çend kurşa ji dersên programê dixwênin. Bêhtirên kurşa dor 100 pûanî ne û beramberî çar heftiyên tamrojî/du danî ne. Dersên bekelorya/lîsa û naveroka kursa û daxawziya zaniyariyê di pîlanên dersa de, ku perwerdekirinê bi rê ve dibin de, têne diyarkirin.



Dereca nota

Dereca nota ji A-F e û A dereca herî bilind e, E ya herî kêr e jibo dersê derbas bike/xilas bike. F xilas/derbas nake. Xwendevan piştî her kurşa ku xilas dike nota/qerna distênê. Daxwaziyên zaniyarî yê netewî/giştî jibo dereca E, C û A hene.

Strukûra programan

Dersên bekelorya/lîsa yê hevbeş ew in ku her xwendevanê bekelorya/lîsa dixwê. Ev dersên ha inglîzî, dîrok, spor û sehet, matematîk, xwezaneyî, ol/dîn zanyariya civakî, siwêdî an siwêdiya wek zimanê duwem in. Xwendevan wa dersên bekelorya/lîsa yê hevbeş, di programên cuda de, kêmtir an zêdetir dixwê.

Ji xeyn ji wa dersên bekelorya/lîsa yê hevbeş, di her programê de çend dersên hevbeş hene ku hemû xwendevan di programeke taybet/xisûsî de dixwê. Ev ders in ku taybetiya/xisûsiyeta programê diyar dikin.



Ji xeyn ji programa guhdan û lênerînê di hemû programên dî de xwendevan di-
karin rêçên xwendinê yî cuda hilbijêrin. Ji xeyn ji wê, di her programê de kurşên
cuda hene ku mirov dikare zaniyariya xwe têde kûrtir bike. Di vê xwendinê de
îmkanê hilbijartineke şexsî jî hene.

Di hilbijartina şexsî, ya programa meslek de divê dibistan kurşên ku bingehekê ji
xwendegeha bilind re jî dideynin bide. Di hemû programan de gerek îmkana ku
xwendevan bi kêmayî kurşeke estetîk, spor û sehetê/tenduristî bixwîne hebe.

Di xwendinê hemû programan de, wezîfeke bekelorya/lîsa heye ku xwendevan
divê çêkê û xilas ke, jibo ku bê qebûl kirin û şahde/dîploma xwe bistênê. Ew
wezîfe kurte zaniyariya bekelorya/lîsa ye.



Xwendina şagirtiyê

Di programa meslek de îmkane hilbijartina xwendina şagirtiyê heye. Ew xwendevanê ku xwendina şagirtiyê dihilbijêrê, pirtirê xwendina xwe li kargehekê an çend kargeha derbas dike. Armanca/hedefa xwendina şagirtiyê û daxwazî/şartên wê weke yên xwendina li dibistanê tê kirin e.

Jibo ku navbera programa bekelorya/lîsa meslek û kargehê xweş bibe, hem programên giştî û hem jî yên herêmî/lokal hene.

Du şiklên/tîpên dîplomê

Xwendevanekî ku programa bekelorya/lîsa xilas kiribe, dikare dîploma bekelorya/lîsa bistênê.

Jibo ku xwendevan karibe dîploma meslek bistênê divê xwendevan 2500 pûan xwendibe û ji wan 2250 pûan xilas kiribe. Gerek xwendevan dersa siwêdî 1 an siwêdî ya zimanê duwem 1, ingilîzî 5 û matematîk 1 xilas kiribê. Şartekî dî jî ew e ku xwendevan divê 400 pûan ji dersên programên hevbeş xilas kiribin û wezîfa bekelorya/lîsa jî xilas kiribê. Xwendevan dikare dîploma meslek bi riya xwendina şagirt û xwendina meslek ku li dibistanê kiriye bistênê.

Jibo dîploma xwendina hazirkariya xwendegeha bilind, divê xwendevan 2500 pûan xwendibê û ji wa 2250 pûan xilas kiribê. Divê xwendevan dersa siwêdî 1, 2 û 3 an siwêdiya zimanê duwem 1, 2 û 3, ingilîzî 5 û 6, û matematîk 1 xilas kiribê. Ji xeyn jî wê divê wezîfa bekelorya/lîsa jî xilas kiribê.

Dîploma xwendina hazirkariya xwendegeha bilind, daxwaziyeke bingehîn jibo xwendegeha bilind didê.

Di www.skolverkt.se de, di bin Pêşdibistan û dibistan (Förskola & skola) de bêtir li ser daxwaziyan bingehîn jibo xwendegeha bilind bixwêne. Piştî, Xwendina bekelorya/lîsa (Gymnasieutbildning).

Dîploma xwendina meslek, xilaskirina dersa siwêdî 2 û 3, an siwêdiya zimanê duwem 2 û 3 û ingilîzî 6 jî daxwaziya bingehîn ya xwendegeha bilind didê.

Mafê hemû xwendevanên li programa meslek heye ku wa kursên ku daxwaziyan bingehîn jibo xwendegeha bilind didin, bixwênin.

Ji xeyn ji daxwaziyên bingehîn, bêhtirê caran xilaskirina kursên taybet jî, jibo hinek xwendinan tê xwestin.

Xwendevanê ku daxwaziyên şahda/dîploma bekelorya/lîsa xilas ne kiribê, dikarê ji bedêla dîplomê de îsbat/belga xwendinê bistênê.

Mitehidî

Gerek mitehidî di her beşê bekelorya/lîsa de xwiya bê/hebe. Di hemû programan de mecala ku xwendevan bi kûrayî li ser mitehidiyê bisekinê heye.

Beşek ji Ewrûpa

Bekelorya/lîsa siwêdî bi sîstêmên kompetensên Ewrûpî ve girêdayî ye. Armanc bi vê yekê ew e ku hevvelatîyên ewrûpî bi rihetî karibin herin û werin û jibo ku perwerdekirineke dûvdirêj hêsantir bibê.

Xwendina jibo mezina

Xwendina jibo mezina jî divê pîlanên dersên bekelorya/lîsa bikar bênin. Wekî din divê xwendina jibo mezina fleksîbel bê û li gor daxwaziyên wan be.

Her 18 program

Programên meslek

- Program zarok-û dema vala
- Programa avakrin û bînayiya
- Programa elektrîk-û enerjîyê
- Programa motor-û veguhastinê
- Programa tîicaret-û îdarî
- Programa destkarî
- Programa hotel-û tûrismê
- Programa teknolojiya endustrî/sanayî
- Programa zîraetê/çandiniyê
- Programa xwaringeh-û tiştên xwarinê
- Programa germê, hewaguherîn, sîstema karêza-û mal û milkê neguhêzbar.
- Programa tedawî-û lênerînê

Programên hazikariya xwendegeha bilind

- Programa aborî/ekonomî
- Programa estetîk
- Programa edebiyatê(ziman,felsefe,dîrok)
- Programa ilim/xwezanasî
- Programa zanyariya civakî
- Programa teknoloji

Programên agahdarî

Pênc programên agahdarî wê îمكانên nû bidine xwendevanên bê kompetens/mafdar. Bi riya va programan wê xwendevan bibin xwedî kompetens/maf jibo programeke giştî, ji bazara kar re hazir bin an xwendinê berdewam bikin.

Ew her pênc programên agahdarî ev in

- Programa hazirkariyê
- Programa îndîvîdûel jibo hîlbijartinek taybet
- Agahdariya/Hazirkariya meslek
- Alternatîva îndîvîdûel
- Agahdariya/Hazirkariya ziman



ISBN: 978-91-86529-88-8
Forma Grafikî: AB Typoform
Wêneyê Bergê: Michael McLain
Wêneyên hûndirîn: Michael McLain

Skolverket